

Navê Kurd û Pêwendiyên wî yên Fîlolojîk*

The Name Kurd and its Philological Connexions

G. R. DRIVER**

Wergêran ji Zimanê Îngilizi bo Kurdi: Mehmet YONAT***

Driver, G. R. (1923) "Navê Kurd û Pêwendiyên wî yên Fîlolojîk" (The Name Kurd and its Philological Connexions), wer. Mehmet Yonat, Nûbihar Akademî, no. 15, p.

Genre/Cure: Translation/
Wergêran

Received/ Hatin: 25/08/2021

Accepted/ Pejirandin:
09/09/2021

Published/ Weşandin:
27.09.2021

Pages/ Rûpel: 127-135

ORCID:
0000-0001-8576-7486

Plagiarism/Întihal: This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website./ Ev gotar herî kêr ji aliyê 2 hakeman ve hatiye nirxandin û di malpera întihalê ithenticate re hatiye derbaskirin.

Mimkûn e ku şopa herî pêşîn a Kurdan li ser lewheyekê Sumerîyan ya berîya zayînê sê hezaran bê dîtîna ku li wir wuha behsa wan tê kirin: "axa Kar-da" an "Qar-da".¹ Vê "axa Karda"yê li kêleka milletê *Su* cih digirt û ew li başûrê gola Wanê dijîyan. Wisa tê xwîyanê ku bi îhtîmaleke mezin îrtîbata wan bi "Qur-î-e"yê ve heye ku ew jî li çîyayên rojavayê heman golê dijîyan û li gel Tiglath-Pileserê Yekem² şer kirine. Her çiqas nasnameya fîlolojîk ya van herdu navan teqez nebe jî sebebê wê nedîyarîya di navbera dengên difnî (palatal) û diranî (dental) yên Sumerî de ye.³

- 1 Thureau-Dangin, *Die Sumerischen und Akkadischen Königsinschriften*, i, 150 (No. 22, § 2).
- 2 Tiglath-Pileser's *Cylinder-Inscription*, I, ii, 17 ; iii, 50.
- 3 Ev jî hêla Winckler ve di *Keilschriftliche Bibliotheka Schrader* de, vol. ?, s.v. Tiglath-Pileser ; jî hêla Spiegel, *Eranische Altertumskunde*, i, 356; jî hêla Kiepert, *Lehrbuch der Alten Geographie*, r. 80; di *Zeitschrift für Assyriologie* ya Sachau de, xii, 52 ; û jî hêla Hommel, *Geschichte*, r. 524 ve hatiye qebûlkirin; Di *Z. f. Ass.a Streck* de, xiii, 101. hatiye redkirin.

* Orjînalê vê gotarê jî hêla G. R. Driver ve bi navê "The Name Kurd and Its Philological Connexions" di "The Journal of the Royal Asiatic Society of Great Britain and Ireland", Jul., 1923, No. 3 (Jul., 1923), pp. 393-403" de, di çapxaneyê "Cambridge University Press" de derketiye. Çavkanîya Onlîne ya stabîl: <https://www.jstor.org/stable/25210074> . Ev naverok jî bo JOSTOR jî 95.183.143.14 on Thu, 25 Mar 2021 08:19:51 UTC hatiye daxistin.

** Magdalen College, Oxford.

*** Zaningeha Mêrdin Artukluyê, Fakulteya Edebiyatê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdi, Dr. Mardin Artuklu University, The Faculty of Literature, The Department of Kurdish Language and Literature. mehmetyonat@gmail.com

Cihê duyem yê vê kokê *Kardûchi* (Καρδοῦχοι) ya Ksênefon (Xenophon) e.⁴ *Gortuya* Grekî ku di Asurî de *Qurti* ye û qertafa pirjimarkirinê ya Ermenîkî *-kh* standiyê û di Urartuyîya di dîroka berîya zayînê pênc sedan de di forma *Gortu-khê* de ye, eslê vê peyvê ye. Baş tê zanîn ku bêjeyên bi *-oûχος* ve qedîyayî ji hêla Deh Hezaran (The Ten Thousand) ve ji zimanên din bo Grekî hatine asîmîlekirin.⁵ Dîsa, her çiqas di demeke wiha zû de di zimanê Ermenîkî de em rastê tişteki neyênê jî, lê divê ev bikaribe bê derxistin ku *Gortu-kh* an jî *Gortai-khên* (Kurd) Ermenîkîya klasîk ku di Grekî de wekî *Kardûchi* ye, *Kardûchiya* Grekî versoyaneke nêzik ya Ermenîkîya axaftinî ya berê be. Ev arguman ji hêla du rastiyên girîng ve têne piştrastkirin ku ji hêla Stephanusê Bîzansî ve hatine vegotin: (1) Gelê ku ji hêla Ksênefon ve wekî *Taochi* (Τάοχοι)⁶ tê binavkirin *Tai* (Τάοι)⁷ ye ku ji hêla Sopaenetus ve bi vî awayî hatiye qeyîtkirin, û (2) gelê *Gordiaea* jî wekî *Gordî* û *Gordochî*⁸ û bi hin navên din têne zanîn. Ev herdu divê transkîrîba navên Ermenîkî *Taikh* û *Gortukh* bo alfabeja Grekî bin ku Grekîyên wan bi vî awayî ne: *Τάοι* û *Τόρδοι*.⁹ Varyasyoneke *Kardûchi* û *Gordochî* jî *Kardakes* (Κάρδακες) e ku ev nav tenê ji bo terîfkirina leşkerên bi peretî yên Asyayî tê bikaranîn. Qasê ku tê zanîn ew ji cihên dûr yên *Kardûchi* îşqal kirî têne kirêkirin. Pêkan e ku di serî de wekî navê eşîrekî hatibe bikaranîn û paşê ev bêjeya *Kardakes* ji bo hemû leşkerên bi peretî hatibe emilandin.¹⁰ Di nameyeke alimekî de ku li ser Strabo (*Geogr.*, xv. 734) hatî nivîsîn, noteke balkêş heye ku dibêje ew wekî *Kardakes* têne binavkirin “lewra ew debara xwe bi dizîyê dikin, jixwe *karda* tê wateya “mêranî” û “şerxwaz” - ku esas *kurd* di Farisî de jî tam tê vê wateyê. Hema bêje ne muhtemel e ew ji bilî mêrên eşîrên kurdan bin ku qismen bi rêgirtinê û qismen jî bi leşkerîya peretî ya artêşên bîyanî debara xwe dikirin.

Lê paşê xeletiyên paşgirên *-oûχοι* û *-οχοι* hatine kişîfkirin. Her çiqas paşgira *-oûχοι* ji bo demeke dirêj ji bo çêkirina rengdêrên cihî¹¹ hatibe bikaranîn jî, ev paşgir bi *-αῖοι* an *-ἦοι* an jî yên wekî van ve hatine guhertin. Pliny bi awayeke teqez dibêje “gelê berê wekî *Cardûchi* dihat binavkirin lê niha *Corduani* ye”¹² cîranê Adiabeniyan¹³ bûne. Li ber çemê Dîcleyê û cihên din yên “çiyayên *Gordiyaci*” jîyane ku heman çem Urfaya (Orroean; Edessa, di Suryankî de Urhai û îro Urfa) Erebi ji Adiabeniye

4 Xen., *Anab.*, III, v, 15, 17; IV, i, 2-4, 8-11; iii, 1-2, 7, 26-7, 30; v, 5, 17; VII, viii, 25.

5 Froma yekjimar *Cardûchus* formeke çêkirî ya pirjimara *Cardûchi* ye. (Xen., *Cyr.*, vi, 3, 30).

6 Xen., *Anab.*, IV, iv, 18; vi, 5; viii, 1; V, v, 17.

7 Steph. Byz., *Ethnica* (Meineke), s.v. *Táοχοι*, i, 211 ; binêre notên wî yên derbarê *Καρδοῦχοι* de, i, 358.

8 I I. *ib.*, i, 211.

9 Binêre Meillet, *Esquisse d'une Grammaire comparée de L'Arménien classique*, pp. 40-3, û Hü - schmann, *Armenische Grammatik*, pp. 404, 518-20.

10 Binêre Polyb., *Hist.*, v, 79, 11, 82,11 ; Corn. Nep., *Datames*, viii, 2; Arr., *Anab.*, ii, 8, 5-6, û Plut., *Sec. Epic.*, xiii ; dîsa binêre Steph. Byz., s.v. *Kardakes* ; Hesych., *Lex. (Schow)*, p. 403, (Alberti), ii, 147 ; Phot., *Lex. Synag.* (Porson), i, 131.

11 Nota wergêran: Ev wekî paşgira *-fya* Kurdî ye. wekî: Cizîrî, Xanî, Mûşî.

12 Plin., *Hist. Nat.*, vi, 15, 44.

13 Nota Werger: Pey miladê sedsala 1ê de di navbera Zapa jor û Zapa jêr de jiyane.

cuda dikir.¹⁴ Strabo yê duym wekî *Kardûchiyan* bi nav dike û dibêje “axa *Gordyaei* ji hêla yê berê ve wekî *Kardûchi* dihate pênasekirin.”¹⁵

Ev herdu form û varyantên wan ku pirî caran ji ber nebaldarî û nezanîna mustensîxan bû, û wisa jî di nav nivîskarên Grek û Romanan de û disa di nav nivîskarên Xirîstîyanan de berdewam kir.

Tabloya Şêweyên ji Sedsala Yekem ya Berîya Zayîne Heta Nivîskarên Grek û Latîn Hatine Bikaranîn

Di Sedsala yekem ya berîya zayîne de:

Corduani (Sall., *Hist. Fragm.*, iv, 72).¹⁶

Gordyene (Diod. Sic., *Hist. Gr.*, xl, 4; Strab., *Geogr.*, xi, 527; xvi, 747).
Gordyacus and Gordyaeā (Strab., *Geogr.*, xi, 522, 529, 532; xvi, 739, 746, 747, 750).

Di sedsala ewil ya piştî zayîne de:

Gordyeni û **Gordyene** (Plut., *Luc*, xxi, 505; xxvi, 508, 509; xxix, 512; xxx, 512; xxxiv 515 ; *Pomp.*, xxxvi, 638).

Corduani (Plin., *Nat. Hist.*, vi, 44).

Gordyaeus (Plut., *Alex.*, xxxi, 683).¹⁷

Kordyaei (Josephus, *Archeol.*, i, 3, 6, § 93).

Cordiaei (?) (Plin., *Nat. Hist.*, vi, 118, MSS. wekî *Condiaei* or *Gurdiaci*, û vi, 129, “*Coridaeorum*” an “*Choridiorum*” xwendine.

Di sedsala duym ya piştî zayîne de:

Gordyene (Ptol., *Geogr.*, v, 12; xi, 527 ; App., *de Bell. Mithr.* cv).

Gordyaeus (Ptol., *Geogr.*, v, 13; Arr., *Anab. Alex.*, iii, 77).

Korduene (Dio Cassius, *Hist. Rom.*, xxxvii, 5, 3).

Kardynus (Dio Cass., *Epit.* Ixviii, 26, 2 : τὸ Κάρδυνον ὄρος)

14 Id. *ib.*, vi, 31, 129.

15 Strab., *op. cit.*, xvi, 747. Ji bo referansên *Kardûchi* binêre Strab., *Geogr.*, xvi, 747; *Epit.*, r. 148 (*Kardûchiâ*); Diod. Sic., *Hist. Gr.*, xiv, 127; Plin., *Hist. Nat.*, vi, 44 ; Ptol., *Geogr.*, vi, 2; Agath., *Hist.*, iv, 29 ; Theophyl. Simoc, ii, 10, 2.

16 Di pasajên Josophus (*Archeol.*, xx, 2, 2, s. 34) *MMS de Καρδῶν, Καρῶν, Καρεῶν hemû nivîsên xeletî yê muhtemel in ji bo bêjeya Καρδῶν. Her çiqas forma Καρδῶν dibê bi Γὸρδοι bê muqayesekirin lê ev ne pêkan e.*

17 Nivîskarên din yê Bîyografîyên Îskenderê Mezin wekî *Cordiaei*, *Gordyaei* (Curt. Ruf., *Hist. Alex.*, iv, 10, 8; v, 1, 4, 14-15), an jî wekî *Cordiaei* (*Epit. Rer. Gest. Alex. Magn.*, xxix); di pasajekî de wekî *Curtius* (*op. cit.*, iv, 10, 8) xwendine. Hin MSS wekî *Cordei* xwendine.

Di sedsal çaran ya piştî zayînê de:

Kardûênî (Petr. Patr., *Hist.*, di nav *Fragma Miiller de. Hist. Graec.*, iv, 187).

Cardueni (Sext. Ruf., *Brev.*, iii, xx, ku ji *Historia Miscella*, x, 3 hatiye kopîkirin; Eutrop., *Hist. Rom.*, viii, 3, 1).

Kordyaei (Euseb., *Praep. Ev.*, ix, 11; *Onom.*, 208; *Chron. Armen.*, r. 23).

Di sedsala pêncan ya piştî zayînê de:

Cardueni (Not. *Dign.*, Or. xxxvi, 34, û *Occ.* vii, 209) an jî Cordueni (Not. *Dign.*, Or. xviii, 6, 19, û *Occ.* vi, 40, 83).

Corduena (Amm. Marc, *Res Gest.*, xviii, 6, 20; xxiii, 3, 5; xxiv, 8, 4, 8, 5; xxv, 7, 8, 7, 9).

Cordyena (Jul. Honor, Di nav *Geogr. Lat. Min.*a Reise de, xxx, 5, û Aethicus, *ib.*, lxxvi, 21).

Kardûênî (Zosimus, *Hist. Nov.*, iii, 31).

Di nivîsên nivîskarên Kîlîseyan de:

Cardyeus (Epiphan., *adv. Haeret.*, i, 1, 4; ii, 66, 83).

Cordulia (Philostorg., *Hist.*, iii, 7; *Lib. Generat.* (Reise), § 24, r. 116, li gor texmîna edîtorî l xetayek e û divê bibe a û divê wekî Cordyaia bê xwendin; dîsa binêre *Excerpt. Lat. Barb.* (Frick), r. 208, ku hin MSS. wekî Cordyna xwendine; *Monum. Germ. Hist.* (Mommsen), *Saec.* iv-vii, vol. i, r. 106).

Codryalia (Syncellus, ji hêla Goar hatîye edît kirin, r. 47, ku hin MSS. xwendina wê vergerandine ser Cordulia).

Divê tu girîngî li varyasyonên din neyê dayîn ku di nav MSSan de gelek in û dîsa divê tu qiymet neyê dayîn bo hin formên xeyalî yên wekî *Gordyas* ku ji hêla Stephanusê Bîzansî¹⁸ ve wekî axa *Gordyaei* hatiye pênasekirin. Lê rengdêreke cihî (gentilic) heye divê li ser bê sekinîn û qasê tê xwîyanê ji heman kokê hatiye. *Cyrtii* ji hêla hin nivîskarên klasîk ve wekî eşîreke Asyayî hatiye behskirin ku wekî *Kardûchi* û *Kardekesan* bi alîyên xwe yên nîşangêrîyê ve têne zanin. Strabo dibêje ew li Îranê nêzîkê çîyayê Zagrosê li cem Mardiyan¹⁹ îqame dikin û ew bi şelandinê (robbery)²⁰ debara xwe dikin. Hem Polybius²¹ û hem jî Livy²² qeydên xwe de dîyar kirine ku ew wekî leşkerên nîşanger dihatine kirêkirin. Qereker û cihê van miletan bi hev re nîşan didin ku ew bi *Kardûchi* re têkildar in. Dengê bideng ya kin berîya paşgira

18 Steph. Byz., s.v. Gordyaca.

19 Notê bi jêgirtina jêrê re muqayese bike, di nav *Aneed*, Syr. de, iii, p. 332a Land de.

20 Strab., *Geogr.*, xii, 13, 533; xv, 3, 727.

21 Polyb., *Hist.*, v, 52.

22 Livius, *ab Urb. Cond.*, xxxvii, 40, 9 (cihê ku ew wekî Cyrtai dihatine binavkirin), û xlii, 58, 13.

dawîyê tê (di varyasyona *Cyrtaei* de bi awayeke ne rast hatiye dirêjkirin ku di formên din de teqez kin in) ku di hemû formên navan de wekî hev in (wekî, Qardā, Qurtî-e, Kardû-ochi = Kardûchi, Kardā-kes, Gordy-aei, û Cordû-eni, hwd.). Girîngîya van dê paşê di teqezkirina filolojîk ya vê argumentê de derkeve meydanê.

Ev nav paşê bi navê *Qardû*²³ kete zimanê Suryankî. Ev ax di navbera Turabîdîn, çîyayên Zagrosê û Cizîrê (Jazîrat-ibn-‘Umar) de ye ku cihê *Kardûchiyan* e û îro yên li wir dijîn bi piranî Kurd in. Dirêjkirina bidenga dawî ji ber taybetîya qedandina bêjeyan bi bidengên kin yên di zimanên Semîtîk de ye. Bi vî awayî ev bidenga kin ya hate nîşandan ku taybetîyeke bingehîn e, yan dikeve yan jî bi herfeke bêhêz ve tê xurtkirin. Di encamê de, li gor taybetîyên Suryankî *Gortu-kh* bûye *Qardu-w* û paşê jî herfa bêhêz bi bidenga kurt ya berîya xwe ve bûye yek û bûye *Qardû*. Ev terîfa rast ya qedandinê ye ku heman form di Erebi de jî heye. Di Erebi de bidenga kin ya dawî *a*²⁴ ye wekî di *Karda-kes*, û ev bûye sebep *Qarda-y* derkeve meydanê û dawî de jî bûye *Qardâ*²⁵. Di pasajekê de, versiyona Erebi wekî *Qardûhû* ya Suryankî *Qardû*²⁶ ye, lê ev îstîsnayî ye. Bi gelemperî *Qardû* û *Qardā* wekî hev in.²⁷

Bajarê Cizîrê (Jazîrat-ibn-‘Umar) ku paytexta *Qardūyan* e, di Suryankî de bi çend navan ve hatiye binavkirin. Ev cudahî ji ber paşgirên rengdêrên cihî (gentilic) ne. Ev formên jêrê tene bikaranîn:

Gāzartā d’Qardū (Wright, *Catal. of Syr. MSS.* di nav the *Libr. of Cambridge Univ.*, ii, r. 746; Forshall û Rosen, *Catal. MSS. Or. li M. Brit.*, pp. 102a, 104b; Assemanni, *Bibl. Or.*, ii, pp. 2516, 2566; Barhebr., *Chron.* (Bruns and Kirsch), p. 329).

Gāzartā d’Qardwîthā (Forshall and Rosen, *op. cit.*, r. 102a; cp. Assemanni, *Cat. MSS. Bibl. Apost. Vat.*, iii, p. 355).

Gāzartā d’Qardawāyê (Wright, *Catal. of the Syr. MSS.* li the *Brit. Mus.*, iii, pp. 1181a, 1182b).

Forma dawî nîşanê me dide ku rengdêra cihî ya ku di Suryankî de ji bo pirjimarîyê tê bikaranîn bi *Kardûchî* û *Gordiaei* û hwd. re wekî hev e. Ev form di Suryankî de forma herî berbelav e.²⁸ Dîsa, di noteke *Anecdota Syriaca* (vol. iii, r. 332) ya Land de bi awayeke eşkere tê vegotin ku *Qardawāyê* û *Marûdāyê* (yanê Mardiyên Kevnare)

23 Mesela, Barhebraeus, *Nomocanon* (Hunt MSS. 1), 36 v., *Ascensus Mentis* (ib., 540), 83 v.; *Patr. Or.*, Sim'on bar Sabba'e, cp. 23 (û 25); Wright, *Catal. of Syr. MSS.* di nav the B.M., iii, 1136a-6 de; al.

24 Nastûrî *Qardû* wekî *Qardā* vedibêjin ku ev jî béguman bandora xwe li ser *Qardāya* Erebi heye.

25 Avri et Slibā, *de Patr. Nest. Comm.* (Gismondî), r. 80; Maris, *de Patr. Nest. Comm.* (Gismondî), pp. 2, 3, 10; Balâdhurî, 176, 5; At-tabarî, iii, 610, 3 Ibn Fâqîh, 132, 8; 136, 2; Ibn Rustah, 106, 14; 195, 12; Ibn Khurdâdhbih, 76, 12; 245, 15; Mas'ûdî, *Tanbih*, 53, 12; Ibn Hauqal, 145, 13. Yâqût (i, 476) dibêje *Qirdā* ku ew lê zêde dike dibêje ev millet wekî Qardā tê bilêvkirin. Dîsa bi Bâqardāya Erebi re bide ber hev (Ar-tab., iii, 610,1).

26 *M'art d'Gazê* (Bezold), *Syr.*, r. 98 = Ar., r. 99.

27 Elias of Nisibis (Baethgon) in *AbJuindl. f. d. Kunde des Morgenl.*, viii, 3, r. 17.

28 Assemanni, *Bibl. Or.*, vol. i, pp. 204a, 352a; Chabot, *Nest. Synods* di nav *Notices et Extraits* (Paris), x, p. 165 de.

li Asurê bi hev re jîyane. Lê formeke dawî *q'* bêhêz kiriye û ew bûye *k* û *Kartawâyê*²⁹ derxistiye medanê ku di eslê xwe de *Qardawâyê* ye. Alimekî ji pasajeke Suryankî ya di *Jiyana Mâr Yabhalâhâ* de dibêje, *Kartawâ Qûrdâ ye* ku Yahûdî û Keldanî wan wekî *Qûrdâyê*, Faris wekî *Kurd* bi nav dikin. Ew dibêje *Qardawâyê* ji çîyayên *Qardüyê* ne.³⁰ Ev not pênaseya Nöldeke piştrast dike ku derbarê girê li Sûrîyeyê ya di Suryankî de bi navê *Tellâ d'Qûrdâyê* û di Erebi de bi navê *Tallu-'l-Kurdî* tê zanîn.³¹ Bikaranîna vî navî di nav rûpelên heman nivîskarî de diguhere. Eger em bawerîya xwe bi musten-sixan bînin, Barhebraeus hem forma bi *q'yê* hem jî ya bi *k'yê* bi kar anîne ku bigiranî wekî *Qardû* û *Kûrdâyê* hatiye bikaranîn.

Şeweyên ku di Edîsyonên Barhebraeus de Hatine Dîtin

Qardû. (birêkûpêkî,, wekî li jor hate gotin).

Kardû (varyanteke di Chron., p. 522 de).

Qardawâyê (Chron., p. 81, û Chron. Eccl., Abbeloos û Lamy, s ii, r. 75).
Qurdâyê (Chron., p. 306, and Chron. Eccl, r. 731).

Kûrdâyê (Chron., pp. 329, 398, 459, 554,575; ji bo formên ji vê çêbûne binêre Chron., pp. 153, 151, 238; Chron. Eccl., r. 569).³²

Divê em li ser şeweyên di Aramî de têne bikaranîn zêde nesekinin. Ew wekî şeweyên Suryankî ne, lê di wan de hin guherîn çê bûne û ev zêde girîng nînin. On-qelos wexta behsa çîyayê Araratê yê ku keştî li ser sekinî kiriye (Genesis viii, 4), wergera Suryankî daye ber xwe û bêjeya *Qardû*³³ bi kar anîye. Di şeweyê Erebi yê Sa'adiyahê de wekî *Qardû*³⁴ û di Targûma Jerusalamê de wekî *Qardûn* derbas dibe ku ew şeweyê *Kardynosa* Dio Cassius tîne bîra merivan. Di ciheke din ya versiyona Peymana Kevn de (old Testament) (2 Kings xix, 37 = Isaiah xxxvii, 38, û Jeremiah li, 27) heman cîh wekî *Qardû* tê pênasekirin û ji niştecihên wê derê re jî *Qardawayyâ* tê gotin. Di Îbrankîya Rabbînik de forma pirjimar ya *Qard'wâyîn* tê bikaranîn.³⁵ Dîsa li cîyekî *Kardû* wekî varyanteke *Qardû*³⁶ tê bikaranîn. Lê divê mirov zêde qîmetê nede van guherînên ortagrafik yên di Îbrankî de.

29 Chabot, *op. cit.*, x, p. 423 (Syr., p. 165); *Tûmâ d'Margâ, Governors* (Budge), p. 98, *al.*; Bedjan, *Acta Martyrum*, ii, p. 673; Wright, *Catal. of Syr. MSS. li the Brit. Mus.*, iii, p. 1207a.

30 *Mâr Yabhalâhâ* (Bedjan), chap, xiv, p. 121.

31 Nöldeke di nav *ZDMG.*, xxix, pp. 419 ff de.

32 Form *Kûrdayya* di nav nivîsa nivîskarekî sedsala diwazdehan ya pey mîladê re bide ber hev. (J - hannes of Nisibis, di nav *Assemanni's Bibl. Or.*, ii, pp. 221-2 de).

33 Zanyarê ku Erebi wekî Abu-'l-Faraj (Pococke) dizanîn, di r. 13. de wekî "çîyayê Kurd ku wekî Al-Jûdî (çîyayê Cûdiyê) tê bi nav kirin" pênase dike.

34 Heman pasaja forma *Qardûn* *tê de heyî di Midr. B'reshith Rabbâ* û di Mandaic *Great Book* (i, 380, 21) de jî wekî referans cih digire.

35 Y'bhâmôth, 3b, 16a.

36 Rabbînowitz li ser *Bâbâ Bathrâ* 91a.

Hate xwîyanê ku ev şêweyên cuda yên wekî Qarda (an jî Karda), Kardûchi, Gortochi (û Gordi), Kardakes û Cyrtii, Gordyaei û Cordueni, Qardû and Qardâ, Qardawâyê, Qurdâyê, Kartawâyê û Kurdayyâ, hwd. her çiqas di formên cuda de bin jî ji heman kokê tên. Bêhêzbûna dengên palatal û dentalan û tunebûna wan, dîyardeyeke gelek berbelav e di zimanên Semîtîk de. Di vê rewşê de ev navê ji zimanê orîjînal derbasî zimanên bîyanî bûyî, gelek tiştên wê bieceleyî guherîye. Lê bidenga kin ya pey herfeke dental û berîya paşgira qedandinê hatî, bêistîsna hatiye parastin û bûye sebeb ku ev nav bi teqez bê dîyarkirin.

Gelo mirov dikare van şêweyan di *Kurda*³⁷ zimanê Farisî û Erebi de jî dîyar bike ku bidengeke kurt ya dawîyê di şêweyê vê navdêrê de tune û her wext *k*'ya ewil parastiye. Gelo gelê ku bi van navan hatine terîfkirin *Kurdên* nivîskarên Erebi û Farisî behskirî ne? Eger em pêşî pirsra duyem bibersivînin, bersiv ji ber hin sedeman divê erênî be. *Qardaya* Sumerîyan ku li dora gola Wanê bûn û *Qurtîya* ku Assurîyan li çîyayên Azuyê (ku bi îhtîmaleke mezin çîyayên Hazzûyê yên niha ne³⁸) bi wan re şer kiribûn, heman herêm bû ku *Kardûchi* lê jîyabûn. Dîsa ev ew *Qurtî* ne ku di vekîşîna Deh Hezaran (the retreat of the Ten Thousand) de êrîşî artêşa Deh Hezaran dikirin. Herêma ku ji hêla *Gordyaci* an jî *Cordueniyan* ve îşqalkirî hatibû terîfkirin- herême firehtir ya *Kardûchiyê* bû wekî Kurdistana modern, lê li gor cihê *Gordyaea* an jî *Corduene* ev cih berfirehtir bû. Dîsa edetên van hemû gelen bi temamî wekî hev bûn; ew millet çîyayî bûn, “miletêkî hişk, bihêz, wehşî, ji bindestiyê re bêtehemul, hînbûyên şelandinê û bi awayekî hişk girêdayê rêveberîya serokên milletê xwe”³⁹ bûn. Wekî dawî divê neyê jibîrkirin ku alimên berê ew bi *vî* awayî terîf dikirin; alimên berê eleqe di navbera *Kardakesa* Strabo û *kardaya* Farisî de datînin. Di heman demê de ev nîyeta wergêranê *Chronographiaya* Eliasê Nîsîbîsê bû ku di pasajekê de digot “*Kartawâyê* bi navê *Jacobites* têne binavkirin” û ew bi *vî* awayî wergerandibû Erebi “*Akrâd* ku bi navê *Jacobites* têne binavkirin”⁴⁰. Ji alîyê din ve, wekî li jorê hate dîtin, şerhkerê *Jiyana Mâr Yabhalâhâ* bi awayekî aşkeretir dibêje; ‘*Akrâdê* ku di *Chronicla* Barhebraeus de derbas dibe ew gel e ku berê wekî *Kûrdâyê* dihate zanin.⁴¹

Ji alîyê din ve her çiqas wekhevîyên rûkî (superficial) û hin parelêlî hebin jî, nêzikahîya filolojik nehatiye parastin. Nexwe îhtîmal e ku bi taybetî di bêjeyên bîyanî de gelek mînakên *q*'ya Semîtîk ku di Farisî de dibe *g* û *k* wekî mînak bêne

37 Bi gelenperî pirjimara vê bêjeyê di Erebi de wekî ‘Akrâd e. Lê berê wekî ‘Akârîd bû (‘Abdu-‘l-Bâsit, *Dâris* di nav *the Journal Asiatique*, IX, iv, pp. 252-3) ji bo forma regular wekî varyanteke di MS.ekê de.

38 Nota Wergêran: Ev cih çîyayên Qozluxê ne. Lê Îbrahîm Halîl Baran bi perspektîfeke din ve mijarê dinirxîne. Ji bo agahiyên zêdetir binêre (<https://www.kurdistan24.net/tr/opinion/48198-Azu-Da%20C4%20Flar%20B1%E2%80%99n%C4%B1-Nas%C4%B1-Kaybettik?>)

39 Gibbon, *Decline and Fall of the Roman Empire*, chap. lix

40 Binêre Baethgen di nav *Abhandl. f. d. Kunde des Morgenl.*, viii, 3, p. 17.

41 Assemani, *Bibl. Or.*, ii, p. 366

dayîn.⁴² Ev argûman bi wan îhtîmalan têne piştrastkirin; bêhêzbûna *q'yê* bo *k'yê* di zimanên Semîtîk de û tevlihevîya herfa rast ya di formên curbecur yê Ermenkî û Grekî de. Nêzikahîya navbera *Kurd* û *Qarda* û varyasyonên wê yê eslî, bi rastî balkêş e. Lê ne muhtemel e ku bidenga kin ya daliqîyayî ji holê rabe ku tenê di mînakên Farisî û Erebi de wekî îstîsna ev jîhêlêrabûn heye. Di vê xalê de nivîskar bi Nöldeke⁴³ re li ser heman fikrê ye. Lê ji vê zêdetir nivîskarê vê gotarê nikare bi wî re li ser heman fikrê berdewam be. Li gor Nöldeke, mijarên din yê wekî terma *Qardû* tenê herêmeke biçûk nîşan dide lê Kurd ji bo ciheke berfirehtir tê bikaranîn. Dîsa, ew dibêje navê Kurd ji *Kyrtiyyê* tê ku li jor behsa wê hate kirin. Li gor wî *Kyrtii* li ser axa Îran û Medyayê û herêma Kurdên niha wenda bûne. Li dijî vê mirov dikare bêje tu delîlek tune ku vê jîholêrabûna *Kyrtiyyan* piştrast bike. Dîsa, bêdenga kin ya daliqandî ya *Kyrtii* ji formên din kêmtir bîngehîn nîne. Herêma Cizîrê (Jazîrat-ibn-'Umar) wekî herêma *Gortu-khan* hatiye pênasekirin. Lewra ew cihê yekane ya dewlemend ya ber çem bû ku wan dikarî ew bişelînin. Dîsa, Cizîr (Jazîrat-ibn-'Umar) bi xwe yekane bajar bû li wê herêmê ku bi giranî nîfûsa wê ji wan pêk dihat. Li cihên din, ew ji hêla Ereban ve ber bi paş ve ber bi çîyayên bêxêr yê cihê eslî yê wan hatibûn tevdan. Paşê ew ber bi bakûr, rojhilat û başûrê rojhilat belav bûn. Cihê belav bûn çîyayên kêmnîfûs bûn ku ji bo mileteke hejmara wan zû zêde dibe ciheke guncav bû ku ew bêyî tu berxwedanê li hember xwe bibînin li wan deran belav bûn. Lê di mayîna wan ya kêmwext de wan li Cizîrê ne tenê navê xwe li paşîya xwe hîştin lê di heman demê de wan ji gelê xwe hin kes hîştin ku jiyana rehet ya bajaran tercîhê jiyana zehmet ya çîyayan dikirin.

Eger pêwendîya navê Kurd ji hêla filolojîk ve bi *Qurtî* û hwd. ve tunebe, nexwe eslê wê çi ye? Divê meriv li cihên dûr li bersivê negere; alimekî berê di navbera navê *Kardakes* û *kardaya* Farisî de têkilî danîye. Çareserîya problemê di vir de ye. Lewra ka tişteke ji vê xwezayîtir heye ku Faris ku *Qurtîyan* dinasin û bi wan re têkildarbûn, navekî li wan bikin ku ev nav ne tenê bi qerekerê wan re eleqedar be lê di heman demê de bişibe navê wan ê eslî? *Gurd* na jî *Kurda* Farisî, ku muhtemelen di zimanê Babîlî de jî ji koka *gardu* an jî *qarduya* hevkok, tê wateya “dilawer”, “egît” an jî “şerhez”. Dîsa, egîdî û hezkirina şer qerekerên bîngehîn yê Kurdan e. Ji Farisî ev nav derbasî Erebi bûye û ji wir jî di zimanên Ewropî de bûye Kurd.

42 Mesela, *gardu* an jî *qarduya* Asûrî di Farisî de dibe *gurd* an jî *kurd* (egît), hwd.; wekî vê *Kîrmâna* Farisî di Suryankî de dibe *Qarman*.

43 Nöldeke, *Kardu und Kurden in Beiträge zur Alten Geschichte und Geographie: Festschrift für H. Kipert*, pp. 71-82 ; disa binêre Hartmann, *Bohtan*, pp. 90 ff.

Nota Serwehî 1: Nivîskarê vê gotarê nikare tu tiştî bibîne ji bo piştgirîya fikra ku eleqeya Kurdan bi Guti û Gutu re datînin; (Binêre li gotarên li ser *Kurdistanê* yê di *Dictionnaire de la Géographie universelle* û di *Encyclopaedia Britannica*; cf. Sayce, *ibid.* iii, r. 103).

Nota Serwehî 2: Di *Anecdota Syriaca*, i, *Geographica*, fol. i r., Syr., p. 23. ya Land de ev behs derbas dibe; “*Bardâyê* ku gihîştine gola Wanê (Lake Thospitis)”; ev *Bardâyê* aşkere ye ku di çavkanîyên din de derbas nabe, nebe ku xeletîyeke xwendina *Kurdâyê* be guherînek sivik ji navdêra ewil bo navêdêra duyem?